ji weşanên Êketiya Nivîserên Kurd-Duhok
144

Helbest

Tewafa yarê

Emerê le`lê

www.duhokwriters.net

- **Navê pirtûkê : Tewafa Yarê**
- **Navê Helbestvan : Emerê Le`lê**
- **Derhênana hunerî : Mihemed Mela Hemdî**
- **Hijmara Sipardinê: ( ) sala 2008**
- **weşana hijmar:**
- **Çapxana : Hawar - Duhok**

diyarî

diyarî bo hêja mîrê botan celadet alî bedir xan beg yê ko em fêrî tîpên latînî kiren

dîyarî bo daykên şehîdan ewên ko xo gorî welatê kurd û kûrdistanê kirîn …….

Rêncber
14/8/2007
zaxo

Tiwafa yarê

Rojek mi xweş dî wan rojên carê
Ber û jor diçom tewafa yarê
Yara hemî jîn ji bingiha evîn
Destê me li hev bin siha darê

* * *

Dijmin dizanê ezim pir evîn
Li min dinerê xwirt û kerb û kîn
Ji dil her divê ji min bistînê
Ji ber di lê min wê bînê xwarê

* * *

Li bin awira giham aloka
Min xwe avête ser lep û çoka
Ji bo ramosim wê yara şêrîn
Rondik ji çavên min her dibarê

* * *

Berê min di ket şarê sêmêlê
Min divyam her ez bimînim lê
Bajarekî şîn bi hevre di jîn
Tako saxim her ji bîra min narê

* * *

Berî min dida zaxoka delal
Li ser xaborî wê ava zelal
Reng û rûyê wê ji zêr û mircan
Ristekî biha ji gerdena yarê

* * *

Li ser xaborî pira ebasî
Hiner ji mêje kevin tê nasî
Qenter û rêzin hiner ji mêjin
Temaşe di kir li wê robarî

* * *

Pêşberî zore di binre kore
Rijik û bore bajêr di bore
Şahî û seyrane koz û pawane
Jînek ciwane bihtir buharê

* * *

Li ra serî wê çiya yê bêxêr
Gelek bilnde hingî lê binêr
Devî û darin tirî û hinarin
Qendav jê vexwar kefçî û tirarê

* * *

Ji nişkî min dî şarê dihokê
Dî men li çiyê ber û berojkê
Dîmenek mezin taca serê min
Ji ber wî dijmin dikê zare zarê

* * *

Dema ez diçom ber û hindavê
Min ser diçevand ji bo silavê
Wî dikir xebat her ji bo welat
Havîn û pehîz sirr û beharê

* * *

Jê di borîm ez diçome bajêr
Tejî cil û caw ji zîv û ji zêr
Bajarek dirêj avaye ji mêj
Kirî firotin wekî hewarê

* * *

Rewşê di nêrim rewşen û jîne
Govara gulan dicle û metîne
Îzge û tilfizyon şarê ser xwe bon
Xweş lê di nêrim rewş jê dibarê

* * *

Li nav digeram xweş pertok xane
Ji pertok xana yek bedir xane
Xanî û cizîrî elyê herîrî
Nakim ji bîrî ronî û tarî

* * *

Soper markekî ciwan têdeye
Ji çi bixwazî kom û zêdeye
Ji pêlav û çakît berge û qapît
Yek her dixwazê bikê guhdarî

* * *

Diçom hindirî bajarek xiwrî
Ji çi bi kirî ji hindik û pirî
Ji bo zaroka zava û boka
Ji bav û dêka çiqas bikarî

* * *

Li jor di nêrim cihê ser baza
Min lê dinerî ji hemî awaza
Cihê omîda mêr û egîda
Ji kevn û zûda didin biryarê

* * *

Min lê dinerî qesr û qûnaxin
Li dorê rezin yêdî jî baxin
Hemî avîne ji tuxmê şînahî
Xunav û şevnem her lê dibarê

* * *

Di çom zawîte berê min li jor
Gelî û çiyane dinêrim ji dor
Berû û kizwanin j selwê ciwanin
Tînê bîra min evîna carê

* * *

Hingî diçom ez çiya bilindin
Li jêr dinêrim bajaro û gundin
Mijmij û darin hemî hinarin
Jê têr nedibûm sibho êvarê

* * *

Ji wê diborîm kurê gavana
gozo pawanê pez û şivana
Hemî kizwano ben û kevotin
Di hat bîra min seyranên carê

* * *

Gelek ji daran hin belalîko
Bin geha mala hir mizê çîko
Cihê berana ji mêr û zana
J xanim û cana nayên jimarê

* * *

Dema min didît dêra gijnîkê
Cihê seyrana zava û bûkê
Warê pêşmerga mêrxas li cenga
Dihat bîra min ew şevên tarî

* * *

Ez bi soperê diçom ser singê
Cihê pêşmerga şera û cengê
Warê kevnare bi dar û bare
Li paş di nêrim çiyayê garê

* * *

Gare bilinde çiyakî rinde
Bi aranyome hindir û binde
Qonax û qesre li jorê befre
Bin geha jînê ji bo hewarê

* * *

Dijmin li dorê sûrihek lê kir
Çend qesir û qûnax ser û ber çêkir
Bi keyif û şahî dikir ronahî
Ji bona min felek tev anî xiwarê

* * *

Rêbirê di çom gundê şehbazê
Ji fêqî mişte ji çi bi xwazê
Mêrg û çîmenin şahî û kenin
Dema to bighî hin dav û barê

* * *

Ser sing l ber singe şoxekî şenge
Cihê mîreka bi nav û denge
Çiya û newalin pesar û palin
Dida bîra min şahî yên carê

* * *

Beram berî wê di çom bamernê
Qontara çiyê li ber bedenê
Avekî wek ro ji hingiv û gezo
Sibha biçî zo danê êvarê

* * *

Ji wê dinêrim şikefta enîşkê
Cihê hêlan û çincîl û tişkê
şikeftek dizê av didê her derav
cihê seyrana xiwer û vexiwarê

* * *

dijmin ava kir kelhekî mezin
kedî kirina xezal û bizin
têde dikir her seyran û şahî
kebab û tike bist lê dişarê

* * *

jê diborîm ez di çom ser riya
li ser destê rê gundê botiya
rêkî çep û çor di nêrim li jor
hingî di çom ez ji ber min narê

* * *

min xweş dinêrî li wa dar û biya
li jor min didît gelî û çiya
kuncî birincin ji tuxmê qencin
çendî dibêjim nayen jimarê

* * *

min hew dî giham gundê êtîtê
avekî zelal ji wî gelî tê
hingî min didît şînî û avin
ji keyfa yarê nakim hedarê

* * *

bi lezekî bez geham qidişê
cihê seyrana her demî xweşê
medreb û avin mêrg û gulavin
şahî li navin her dem û carê

* * *

rez û behîvin ji xox û sêvin
xweşî li nêvin her lê di civin
kizwan û goze her lê newroze
min dida soze ji bo naz darê

* * *

ji mêjve min nedî ji ber dibim kedî
ji şerma û fedî li min bibê xwedî
hindî çiya ne li hev badane
ji hev xwiyane ser bejna yarê

* * *

li ser sotekî diçom solavê
newalekî kûr mişte ji avê
bi xwirt û bi hêz ji banî tê xwar
bi pişik û pejaq mij jê dibarê

* * *

ji banî rijek bihêz tê xwarê
av didê gelî dar û beyarê
ba yekî hînik li wê herêmê
li gund û bajar li wê bi warê

* * *

min her di viyam bi mînim li nav
şevnem dibarê avîya ji av
bi xox û tirî tijî li her derî
ta sirta serî her wek buharê

* * *

bejnekî bilind hemî tevde şîn
li ser dêm û ro rija gelek xwîn
li pêş berê wî çiyayê gare
metîn li pişte rojîn hewarê

* * *

ez diçom li jor ber û amêdî
jiyê min borî noka min ew dî
kelhekî bilind raserî çend gund
warê kevnare metîn li barê

* * *

hindî bilinde piyek rêbare
li dorê rezin hawêr bi dare
li jêr gelîne pal û pesare
bajarek ji mêj li ser zinarê

* * *

weke çiyakî li hev baday
ji ko dinêrim ji min ve xwiyay
dida bîra min kul û derdê min
mîtan û mîdî ji bîra min narê

* * *

gava di çom nav wekî bihiştê
gul û rîhana bihnek jê xweş tê
bi dar û bare her demî sare
taca ser kulox ji rengê tarê

* * *

li bin amêdî re gundê dêrê
hin pêç û çepek di ketin li rê
xweşîkî bi jîn dida herêmê
xuda bi tenê bi vê dikarê

* * *

ji wê her diçom gundê bê badê
xelek bi xelek hevdo bernadê
çiyakî bi dar li bin avên sar
hejîr û hinar min jê dixwarî

* * *

ji wê di borîm gundê guherzê
jê di borîm ez bi lez û bezê
bi sosk û kewin sbehî bedewin
ji tuxmê kewên çiyayê gabarê

* * *

bi dehl û devî tuxmê wek hevî
bero kizwanin tejî wek zevî
bi xemil û xêzin belav û rêzin
hev di himbêzin tev sih û tarî

* * *

ber bedena rê gundê ber çiyê
li ber bedena banê kaniyê
kelîlik bi dare bî sipîndare
dehl û hinare li bin pesarê

* * *

di çom her derî bi dare xurî
devî û dirî kizwan û berî
ji ko binerî hejîr û sêvin
darên kevnare wekî kewarê

* * *

li ser destê rê gundê der gelê
hingî delale li min dida kelê
kanî û ave xweşî li nave
kar û bi zave li wê bi warê

* * *

dema diçom ez li ber wî derî
hingî bi dare min lê dinerî
her demî şîne xweş baweşîne
xweşî û jîne li min di barê

* * *

ji wê diborîm gihame kalê
şîn û buhare her demê salê
kanî jê dizin bi koz û pezin
ji mih û bizin ji berx û karê

* * *

ji tovê çandî hejîr û tirî
behîv û simaq bi kove herî
mazî û benavin rêz û belavin
mêrg û gulavin bihin jê dibarê

* * *

ji wê diborîm gundê sêrêyê
bi pîve ji rê ta serê çiyê
darên xuiristî ji hev veristî
tejî bi mişti pelên ji darê

* * *

sêryayê diçom ta şêla dizê
gelî û ave ji her derî dizî
gundekî ave rêz û belave
pirek li nave ji bo rêya rê

* * *

hingî ez di çom her dirametin
min lê dinerî rêzik û xetin
şînî û darin ficik û xiyarin
sêv û hinarin her wek buharê

* * *

rê barek dirêj li nav do çiya
li jor dinêrim pal û geliya
mitik û palin hemî newalin
hinbiz bi darin dar milê darê

* * *

ji wê di borîm çom dêre lokê
jê têr ne di bom ne bi şev û rokê
wa seyran giha xweşî û ciha
ji wan xweşiyan nakim hedarê

* * *

hingî di çom ez dar û devîne
li nav deviya pezê kovîne
li dor zinara li nav pesara
rev û lotika dikin bare barê

* * *

hingî diborîm ketim gomana
ji keriyê berxa pez û şivana
di hat bîra min kul û derdê min
deşt û zozana şevên adarê

* * *

ji bilor vana dengê melolo
ji stiran vana heyran û lolo
ji bêrî vana xaton û cana
dibêjin stirana lê bokê narê

* * *

hirtk û lotikên berx û karika
xwe hil tavêjin li ser tehtika
berad û çiya xweş lê di çêrin
şivan bi fîta dikê guh darî

* * *

rêkî çep û çor
di çom balindê
gundekî ciwan
xweşik û rindê
li bin avên şîn
xweş û baweşîn
hemî tevde jîn
li wê bi warê

* * *

hingî di çom ez
ketim gomana
çiya di nêrim
li asîmana
hingê bilindin
xweşik û rindin
li ser wan çiya
berif lê di barê

* * *

rê bi rê diçom
li pira balinda
hev girêdanabajar
û gunda
binre roşîne
dehl û avîne
her diçom şîne
li ber zinarê

* * *

hingî diçom ez
gundin birêzin
çi avek mezin
dar lê hinbêzin
hemî masîne
ji hev xurîne
di navde jîne
dest jê di arê

* * *

rêkî çep û rast diçom herzanê
berî min dida rêka barzanê
çinar û gozin gul û lîlozin
hev di alozin çol û beyarê

* * *

li pişt herzanê gohê şerîne
hingî bilinde dar û devîne
tev şax û latin hîm û kelatin
tuxmê welatin raser robarê

* * *

tev darê sindî herî kî gundî
rêz û ber bendî nimiz û bilindî
hin bela lokin xox û hilokin
sêv û bihokin ji bo diyarî

* * *

hingî dinêrim di mînim têba
hînik û sare têde kunê ba
darin bi hêzin hinbiz û rêzin
kela dilê min jan jê di arê

* * *

herzanê borîm
cihê şahiya
bin re robare
hînik û sare

di çome bazê
tenbor û sazê
tirî û hinare
çaxê êvarê

* * *

li jor dinêrim
çiya bilinde
têde mêrxasin
hîm û esasin

çiyayê şêrîn
rija gelek xwîn
bi ding û basin
ji bona yarê

* * *

borîm ji bazê
rêkî çep û çor
gelî bi avin
ber û be navin

giham aliyan
li wan geliyan
mij û xunavin
li kaş û beyarê

* * *

li nava dara
dîkê porêne
hin qute pirin
l hev di zivirin

kew û kevokin
sivorî çokin
sosik û birin
li wê kinarê

* * *

li ko dinerî devî û darin
geliyê korin goz û çinarin
li kevî û ava li her derava
wargihê bava hinberê garê

* * *

bi rêkî çepek di çom hemdila
min lê dinerî ji kela dila
kortik û palin gelî newalin
avên zelalin tên ser robarê

* * *

min lê dinerî buxçe û rezin
li nav deviya şivan û pezin
qîzên ciwanin tev bêrîvanin
xanim û canin şîr li şîrarê

* * *

hingî dibînim çiya çi rindin
ji wan çiyayên niviz û bilindin
çiya li piş çiyan ji hev di xwiyan
ji bero maziyan têne veşarê

* * *

min rê ber neda
di çom rizyanê
gundek nêzîke
rexê barzanê
çiya bi cotin
mazî kevotin
cergê min sotin
rengîn xumarê

* * *

berê min dida
gundê hivindika
lof diketin rê
ji newal û coka
li jor zinarin
lat û beyarin
li hev siwarin
ji bilind û xwarê

* * *

ez lê dinêrim
tev darê zanin
bo her amîret
biha giranin
hem darên bejî
ji bona rijî
ji qurm û hejî
biha bi dolarî

* * *

çiqasî bivin
ji darê rijî
bikove herî
hinbiz û tijî
ji bo firoş ga
têra her ciha
giran û biha
ji bo mal darî

* * *

gelek buhaye wekî betrolê
darên xuristî li pal û dolê
wek zêrê reşe ji têrî û xweşe
mirov pê geşe çê têr çê jarî

* * *

hingî di bînim berî û mazî
dibin amîret ji cê bi xwazî
pencer û derî ji textên perî
neynik li ber serî rengê mirarî

* * *

ji zaxo di çom ketim gomanê
gava min berî dida barzanê
warê lehinga şêr û pilinga
bi nav û denga cihê xumkarê

* * *

gava ez giham diketim navê
min berî dida gor û mihravê
dengê xwe hil da jêre pesin da
hilbestek min da sondek mi xwarî

* * *

hin ji helbesta ji wanre xwendin
min ser bi carek jêre çevandin
gora do şêran ji malbata mêran
mehder bi ser de her lê bibarê

* * *

min lê dinerî dihat bîra min
gelek şer û ceng ji destê dijmin
her dem bi leşker tifeng û xencer
ser baz û rêber li ser rêbarê

* * *

gava roniştim li ber serê wan
çend ah û keser min ser wa didan
kar û kêferat her ji bo welat
tev kirin xebat wan şevên tarî

* * *

li gorê min nerî di hat bîra min
jînek şer û ceng her dijî dijmin
şikeft û çiyan dol û geliyan
çepek û riyan nakin hedarê

* * *

di çom ber serê wî bavê mezin
hemî ceng û şer di hat bîra min
li mehabadê daxwaza qadê
êrîş dida ser top û teyarê

* * *

dihat bîra min ji gelek ciha
diço ariya li her çar ciha
geh li amedê geh li pîranê
geh li agrî dax hem dikir arî

* * *

temen hijde bo her dikir qencî
di ço ariya şêxê ber zencî
li silêmanî geh li sordaşê
dibî ser leşker ji bo hewarê

* * *

ji mehabadê diço arasê
çiya tev bi dar çepek û asê
sêsed hezar gav wî dijmin kelaşt
jê dikuşt gelek li wê rêbarê

* * *

hingî di bêjim
can û rewanim
niza çê bêjim
çêrok dirêje

nika pesin dim
jêre bi ser dim
ziman dibî lal
qelem nikarê

* * *

ez ji barzanê
mij mij û tirî
devî û berî
li ko dinerî

diçom saloka
xox û bîhoka
bi dare xurî
şînî ji tarî

* * *

hingî ez di çom
li jor dinêrim
çar hezar gavin
mij û xunavin

di bînim çiya
bilindahiya
bê rê û deravin
ji hewran dibarê

* * *

ji saloka her
cihê mêr xasan
min lê dinerî
xiyar û bacan

di çome rêzan
piling û şêran
buxçe û rezin
li wê şon warê

* * *

pirek li navde li ser geliyan
rêbarekî zor li nava çiyan
berê rêkekî li şane derê
şêrwan û şîva av jê tê xwarê

* * *

pira rêzanê çom şane derê
çend çepek û rê ketin wê derê
deştên piçokin bi nîsk û nokin
lê xweş kelokin çi gerim û sarî

* * *

hingî ez di çom tev bej û avin
çiya bilindin hewr lê belavin
behîv û berî bi dare xurî
ji xox û tirî sêvên berwarê

* * *

ji şane derê di çome bi lê
gundekî ciwan li serê milê
dihat bîra min wî şerê dijmin
pêşmerga dikir şerê teyarê

* * *

dihat bîra min ew şerên ji mêj
dijmin lê dibon kor û ker û gêj
berî didan rev belav bon ji hev
bi roj û bi şev wan şevên tarî

* * *

zawîte di çom geliyê laleş
gelîkî bi dar jê tê bihna xweş
goz û zeytonin gelî û conin
mihrav ji kevnin sonda min xwarî

* * *

dema ez di çom gihame li nav
gelî bi ave tev mij û xunav
qubên sipî do li raserî co
ayîn gih ji mêj li nav vî warî

* * *

giham mihravê newal û avê
hatin li pêş min wek bok û zavê
gore bê pêlav di çom gav bi gav
min lê da silav gihame barê

* * *

gihame derî zana şêx hadî
hefcara li dor geram bi şadî
alîk bihişte rexî dî doje
ava zim zim her rijek li barê

* * *

dema ez giham li ber wî derî
tijî lê qewal belav li her derî
hemî pê xwasin jêre hesasin
yezdan di nasin reben û jarî

* * *

min jor dinerî do qubên sipî
ber berê dijmin jêre pêş kepî
ayîn geh ji mêj gelek xwîn dirêj
mêjoyek dirêj ji mîd û nayrî

* * *

ez lê digeram şahî û bi ken
xanîk kevnare têde tejî den
hemî kevnarin li hev siwarin
rengê kewarin ji bo şevên tarî

* * *

meydanek fireh cihê civatê
warê civîna kar û xebatê
findik û momin lê rêz û komin
agir jê domin pêt jê dibarê

* * *

ji laleş borîm çom kevrê srorê
dar û devîne hawêr li dorê
lobî birincin kaş û derincin
devî û pencin ji bîra min narê

* * *

berî min dida gundê etroşê
jê têr ne dibom ji dîtin û rewşê
tev xort û zerî nazik û perî
bi şal û şapin ji şar û çarê

* * *

min lê dinerî tev rez û baxin
hinar û sêvin milk û ocaxin
gelî û çiyan çepek û rêyan
spîndar û biyan liber rêbarê

* * *

etroşê di çom gundê mirêba
hingî bi dare jê dimam têba
li başorê wê deştekî mezin
bi pez û bizin ji berx û karê

* * *

min lê dinerî deştekî fireh
ji hemî diramet ji genim û ceh
higî min didît werz û jbeşin
gundorên xweşin ser lêvên yarê

* * *

mirêba diçom ber û qesrokê
nav bera akrê şarê dihokê
deştekî pehin dirêj û bê bin
di çom hin bi hin min di kir darî

* * *

ji bo genim û hem nîsk û noka
ceh û garis û gulê berojka
dan û verêje pehn û dirêje
danek ji mêje ji bo cot karî

* * *

di bînim pirojek ji penga avê
li nava gelî li wê deravê
bi bê şînahî hem jî ronahî
xweşî û şahî bidî wê barê

* * *

pirojek çêbê ser ava xazir
bi bê havîngah hemî seran ser
keysê bernedî lê bibin xwedî
penga wê bidî gelî û pesarê

* * *

herêm bicarek bikin co derinc
bibê şînahî kuncî û birinc
şîn bibê berî av lê bigerî
bighê her derî bi cok û cobarê

* * *

hemî tev bibê soya û garis
gulê gul beroj biçînê her kes
kar giha zeytê lê ava bibê
têrî vegerê bar bikê jarî

* * *

ji wê berê min ket ava xazir
ji bin gihek asê li jora wê pir
avekî mezin kanî jev dizin
bi bez û lezin ji bo vexwarê

* * *

ji bo aviya ji bo diramet
tirî xox û sêv bibê rêz û xet
him ji bacana bo dexl û dana
hendez û zana ji jêr û xwarê

* * *

hemî bi carek şînî û bembî
ji bo cil û caw her dem lê hebî
ji zeyt û sabon jînek tev bi jon
tijî û hebon bi kevê warî

* * *

cihê seyran û cihê şahya
yê welatî û hem beyaniya
bibê seyran gih xweşî hemî cih
tirî sêv û bih ser vî robarê

* * *

ji xazir borîm giham xelîkan
min lê dinerî keser û kovan
dihat bîra min enfala kirêt
tev agir û pêt her li wê barî

* * *

zor û bê çare li hev di civan
gund û bajarê xwe her di berdan
wekî zindanê bi dar û lêdanê
wek gov û xanê bi kotek û jarî

* * *

min lê dinerî hê jî hejarin
dorî gundê xwe bê cih û warin
xweşî û jîne bîrî û evîne
hê bihîvîne vegerin warê

* * *

kelih û teh toka tawis û maseka
çixr û îsika hin ji elyoka
çiftik û sê qiban şilikî û şêpan
her jêre heyran hizir û şêyarî

* * *

şingal û eyn zal keçên çav xezal
hugnê sê mitik her naçê ji bal
dîsa vegerin bi gomanê pirin
her jê nagerin çi têr û jarî

* * *

j xelîkan di çom geliyê şoşê
wekî derwêşan zembîl firoşî
gund û gund diçom bi soperê di çom
ber û jor di çom nav warê warî

* * *

hingî ez di çom deştekî dirêj
ji keyfa di bom wek serxweş û gêj
geryam li dorê cihê aborê
di nêrim jorê çiyay akrê

* * *

gelek ji caran min ser lê didan
li başorê wê çiyayê şêxan
deştekî fireh bê bin û ber geh
ji genim û ceh j abora yarê

geryam li dorê li her çar rexî
ji çê bi xwazî heye jê buxwî
kurd û kurdistan ji nas û beyan
çê deşt û zozan bi sal û carê

* * *

ji geliyê şoşê diçome şermîn
gundekî ciwan lê xweşî û jîn
ci deştekî rast xwe ji dijmin parast
min lê dikir qest her wekî carê

* * *

jêre ez dimam gelek dil bi kul
çend cara dijmin her dikir kavil
top û debabe dikir xirabe
ji binve rabe her wekî carê

* * *

îro di bînim warê hêviya
cihê seyrana cihê şahiya
ser biye sahî hemî ronahî
xweşî û şahî didê vî warî

* * *

ji şermîn di çom gihame leka
xort û zerîne ji çav beleka
bi şalên ciwan kiras û xiftan
bi nav û nîşan ji vîna yarê

* * *

ji leka di çom gundê bakir man
war gihê şirîn hemî dexl û dan
deştekî dirêj avaye ji mêj
têr dan û verêj li nav vî warî

* * *

bakirman di çom gundê tiyahok
ceh û genimin hin jê nîsk û nok
hingî min nerî welatek xurî
hinek jê birî bi destê neyarî

* * *

di çom û di çom deşta nav kurê
li jor di nêrim çiyayê akrê
çiya li piş çiya ji kor geliya
li çepek û riya li wê rêbarê

* * *

çiyaykî dirêj bi şox û şenge
cihê pêşmerga lê dibê cenge
tim zêrevanin her lê xwedanin
box û beranin ji bona yarê

* * *

min lê di nerî dar û devîne
darê xuristî ber û mazîne
kizwan û gozin hinarê mizin
sorin lîlozin ji liba hinarê

* * *

deşta nav kurê diçom bê nava
giham li barê min da silava
deştekî ciwan hemî dexl û dan
j xiyar û bacan ji abora yarê

* * *

min lê dinerî bi şov û zevî
deştekî dirist raste wek hevî
werz û ficikin şotî û qitikin
hin jê mitikin ji rast û xwarê

* * *

ji bênava borîm giham sosina
cihê seyrana şahî û kena
hingî di bêje pehin û dirêje
danek verêje ji xwer û vexwarê

* * *

rê bi rê di çom giham kelatê
welatek ciwan warê xebatê
warekî biha xweşiya ciha
ber singa çiya singa pesarê

* * *

ji kelatê di çom gihame alan
çend car dijmin kir kavil û talan
raserî deştê wekî bihiştê
bihnek jê xweş tê didê wî warî

* * *

borîm ji alan gihame akrê
bedena bajêr bi sotik û rê
bajarek fireh dibê parêz geh
bi zanîn û xwende li wî bajarî

* * *

bajarek dirêj li nava gelî
ji dor û nêzîk xuyaye û belê
li navê pire çiya û gire
l hev dizivre li mil û pesarê

* * *

palik û pesar hemî dibin dar
karek bê hedar de şîn bibê war
newal û mitik bi rêz û xetik
ji hindik û gelek li ber rê barê

* * *

bajarek zane tev qutab xane
ji nexweş xane da û dermane
hin misilmanin yezdî filehin
li hev dibanin wek berx û karê

* * *

li jorî bajêr çiyak baday
hîmek li barê ji bin berday
bigirê danê nayê ji banî
hîmek giranî raserî tarê

* * *

tirsim bicarek ew bête berdan
li jor bête xwar ew hîmê giran
raserî tarê tev bînê xwarê
jan û xusarê hin bêne darî

* * *

pirojek çêkin dora bidinê
jêre asê kin li ber bedenê
ji bo neyê xwar ser tar û bajar
qêrîn û hewar rakin bi carê

* * *

rê bi rê di çom gihame qendîl
çend gund ketin rê newal û mesîl
avek di bore hemî abore
wekî xabore li wî bi warî

* * *

di bî perojek li wê herêmê
pengek ji avê raserî dêmê
peng bibê masî xwarnek esasî
da bête nasîn li her bajarî

* * *

cihê seyrana ji xwende û zana
zerî ciwana ji xanim û xana
tev bibê şahî him jî ronahî
bibêt berahî xwer û vexwarê

* * *

avek tim şirîn hemî tevde jîn
warek pir evîn sax dikê birîn
newal tev hemî tejî her demî
bi şextor û gemî li nav robarê

* * *

da bibê seyran li bok û zavan
şîn bibê gelî ji cokê avan
tev bibê xweşî her demî reşî
ji bin hilweşî hov û neyarî

* * *

ji wê penga avê hin co jê herin
hendaz û hindam li dêmê vegerin
tev bibê şîn î bihin xweş û bihnî
da bimrê tihnî li dêm û beyarê

* * *

cihê seyrana cihê şahiya
cejin û newroza li bilindahîa
ji mêvan xana gel dibistana
jîrek û zana bi kevin warî

* * *

ji ava qendîl di çom bê xemê
gundek li milê tev kul û xemê
li ser çekdarin tev nobedarin
bi soz û qerarin li ber robarê

* * *

j bê xemê di çom giham beyarê
sipîlik jeer ji bo hewarê
cihê pêşmerga şera û cenga
ji dil û cerga bi nobedarî

* * *

ji beyarê diçom ber û amoka
li singa çiyê newal û coka
di binre deşte newal û meste
min dikir qeste ji wê beyarî

* * *

rêkî çep û çor diçom hinare
gundekî ciwan bi dar û bare
wekî zozane bi dexil û dane
jînek ciwane li wê rê barê

* * *

ji hinare borêm ço deşta herîr
deştekî dirist raste weke tîr
deştek bê ave pehin û belave
pîvan û gave ser siga yarê

* * *

deşta herîrê heta nav kirê
ji silêvana bighê sîm pirê
deşta sêmêlê dol û nehêlê
şovin dikêlê ji abora yarê

* * *

çar sed hezar gav çi behin û zirav
dol û bej û av hemî li ber çav
bi kove herî tijî li her derî
ta sir ta serî genim bi enbarê

* * *

kurd û kurdistan ji dost û mêvan
ji heval û cîran fileh misilman
têra me hene genim û cene
ji welatê mene bi têr û xirarê

* * *

ji deşta herîrê gihame herîr
bajarek ciwan zane rewşen bîr
hemî sor çîne bi vîn û jîne
ji xwe hêvîne ji daxwaza yarê

* * *

bajarek kevin her kevne tore
li nava çiya lê hawêr dore
nakim ji bîrî franso herîrî
mêr xas û jîrî şenge siwarî

* * *

her dem pêşmerge bi nav û denge
xurt û çelenge li şer û cenge
serbaz û rêzan hevalê barzan
pêre zêrevan li hemî rêbarê

* * *

gundek ji mêje ji dor û dirêje
ger yek çi bêje bi tor û rêze
zane û jîrî b mêrxas û mêrî
eliyê herîrî rewş jê dibarê

* * *

warê mêrxasa cihê pilinga
li singa dijmin şera û cenga
dijmin ticarê bi karê çek darî
peya û siwarê nakê hedarê

* * *

ji herîr di borîm di çome sîsê
ser bedena rê xweş di teyisê
warê pêşmerga li hewar û cenga
şêr û pilinga rojên hewarê

* * *

ji sîsê borîm gihame ewar
hemî şîne dar tev rez û hinar
hem dar û devî bi deşt û zevî
bi xwaz çi bivî ji rengê darê

* * *

ji wê çep û çor çom mame çelkê
cihê hingive bi kewar û selkê
tev hemî darin gir û pesarin
li hev siwarin ji banî xwarê

* * *

ji mame çelkê di çom şeqlawe
hemî mêr xasin ji tuxmê kawe
bajarek pesar hemî dehil û dar
ji hejîr û hinar borîm bi siwarî

* * *

bajarek bi jîn li singa sefîn
xweşiyek bi jîn bi şahî û evîn
hemî bi ave dehil û gulave
xweşî li nave çi gerim û sarî

* * *

ji gelek cara devî û beyara
didan ser dijmin tifing û dara
bi top û tifeng di rojên pir teng
agirê pireng her jê di barê

* * *

herêmek bi ceng her dijî dijmin
dest tim digirtin çi mêr û çi jin
li rojên şera çiya û singera
nav dar û bera li siga neyarî

* * *

rê bi rê di çom şêla siwara
gundekî delal bingiha jara
hemî şîne dar bi sêv û hinar
xemla ji buhar ji xizêma yarê

* * *

şêla siwara di çome kurê
şêwlek pirî teng li wê nav birê
li nava çiya li kor geliya
dar û deviya roniştim barê

* * *

li alê rastê girek xirabe
li ser danîne ser sê debabe
dest keft ji mêran ji ferxê şêran
ji mal bata mêran kirye diyarî

* * *

hinga şer û rev
ne roj û ne şev
birev di meşîn
gumîn û xuşîn

kurd di çon pey hev
tirs û qehir û gef
ji hev felişîn
di ket zinarê

* * *

li alîkî teng
êrîş didan ser
jin û zarokin
bav û dayikin

li jor firoke
ji gelî û coke
zava û bokin
rev bi hewarê

* * *

kurd di reviyan
di hatin kuştin
berî li fires
di çon bi tirsê

pey hev şerîpan
pîr û xort û can
bi tihin û birsê
bi qîr û hewarê

* * *

şêrê kurdistan
arpîc bi destan
weke pilinga
li singa debaba

mes odê barzan
da rijya meydan
êrîş da dijmin
xwe berda xwarê

* * *

ya li pêşiyê ew ço pêşiyê
gullek lê dida li bira hiyê
li hev zivirîn rê hate birîn
şêrê engirî dida pisarê

* * *

gava rawesta şipya sekinî
l yekî dî dida ji keyfa kenî
fermanek dida di got werne pêş
qîr û tilîlî ceng û hewarê

* * *

dîsa l ser piya deyna yekî dî
li singê dida ew jî dima cî
li gel wî leşker serbaz û rêber
her wî dida ser b kîn û neyarî

* * *

ji no kum danî xwe da ser kaba
ser nîva rê kir cenga debaba
ji debab û tenga xwe da ber singa
şêrê lehinga li ser rêbarê

* * *

şonde di revîn berî li çolan
tirs û lerzînek kete dilê wan
berî dan çolê newal û dolê
wek gok û hokê revek pê çarî

* * *

li wan dibo şev her di çon bi rev
çilim û tif û kef taxe li ser hev
ji gund û bajar bi qêr û hewar
dane l ser neyar kesên di karê

* * *

hingê kurdistan tev bo raperîn
xort û mêr û jin li hev êwirîn
wek pezê kûvî dijmin di revê
ji hev dikevî pepok û jarî

* * *

gava şikestin birîn û kuştin
ji gund û bajar hatin maliştin
êzkeh bi qêrîn bi dengê şirîn
li mal vegerin bîr û bawerî

* * *

gund û bajarên
dijmin bi carek
kuştin û lêdan
rêncber û şivan

me bon raperîn
ji nav di revîn
ceng û berxwedan
di çone arî

* * *

ji kurê borîm
gundekî ciwan
darên no çandî
şêwla gerandî

di çome aşke
rind û xweşike
rêz xemilandî
hendeze yarî

* * *

rêzên li pala
çi qade vale
hemî di kin dar
pirin bê jimar

gelî û newala
her çaxê sala
palek û pesar
çiqas bi karî

* * *

aşke ber û roj
bin giha şêran
bajarek viyan
sare wek zozan

çom selahedîn
war gihê şirîn
rewş û dibistan
li ser diyarê

* * *

min lê dinerî
rêkî têr çepek
rêz dikin daran
hemî şon waran

fireh û pesar
kevir û şihar
gir û pesaran
li çol û beyarê

* * *

bajarê vine
ne îro tenê
warê barzanî
ticar dijmin lê

warê omîda
ji kevin û zû de
hem selahedîn
nakê hedarê

* * *

berî min dida
gava ez giham
li pêşiya min
j vîna dilê min

war gihê rewşê
ber derê hewşê
ji xweziya min
xortek şiyarî

* * *

ber û wî diçom
destê min hejanid
bi keyif û xweşî
çend gava meşî

bi çendî gava
li min da silava
reng û rogeşî
j mikir pirsyarî

* * *

ew xortê şiyar bilind xuyay
wî navê şirîn karwan akrey
gelek ciwane têr hiş û zane
nav û nîşane bi ageh darî

* * *

heşt roja temam lê dibom mêvan
têr xwer û razan li otêla taban
bi qedir nasî bi deng û basî
gelek min nasîn ji hevalên yarê

* * *

yek ji wan hevalan emîrê fendî
xortekî hêja bi rast efendî
bernama menber jê didê xeber
rêk û ser û ber ji pesnê yarê

* * *

xortekî hêja dan û verêje
tore bi rêze jê her di rêje
lawekî şane pir xwendevane
jîrek û zane bi pesne darî

* * *

xortek dî min dî jîr û qenc û baş
ciwen û delal azadê dartaş
me dest didan hev jmin xwestin çend peyiv
min dida bersiv çi min dikarî

* * *

pirsa ji min kir hilbest û tore
stiran û awaz saz û tenbore
çi ji min wî xwest min di got ser best
bi tore vehist bi pişke darî

* * *

j dest gahê manşist xunav hergoşî
qendav li malê me bi hevre noşî
lmin didan silav xûşk û dê û bav
dêm gir û bi nav lmin kir diyarî

* * *

xûşkek ciwane pir xwendevane
bi nav vedane xanimek zane
zarav wergêre sorî vejêre
behdîn guhêre rengek şiyarî

* * *

l bajêr di nêrim bajarekî xweş
ji tilvizyonê bighê serê reş
bajarek şirîn bi vîn û evîn
wargihê dêrîn ji kevne warî

* * *

min lê dinerî di hat bîra min
ji şer û cengên her di jî dijmin
her bi kar û bar didin ser neyar
bi karê çekdar cenga neyarî

* * *

bajarek şirîn şirîn ji mestê
ji dor û nêzîk hin dikin qestê
gelek ciwane wekî zozane
lê bom mêvane di çome darî

* * *

selahedîn çom sere jêr bi ger
rêkî tev çepek çom mela omer
çi gundek xweşe ciwan û rewşe
her lê bi meşe bihtir buharê

* * *

sotek pir fireh di çom hewlêrê
deştekî mezin her wekî gêrê
paytexta kurdan zane û xwndan
warê comerdan j bajar û şarê

* * *

li nav hindirî kelhekî bilind
do rê di çinê pir delal û rind
şon warên kevin hawêr wek hevin
bi hiner û fenin li demê nayrî

* * *

kelhekî ji mêj kelha evînê
lê tên veristin çêrokên vînê
wek ya mem û zîn ferhad şêrîn
j çêrokên dêrîn li nav vî warî

* * *

paytexta kurdan aşor û kildan
yezdî turkoman di jîn wek biran
bi dîmukratî kom û civatî
ser vî welatî lşar û bajarî

* * *

l rewşê di nêrim rewşenek bi vîn
zanko dibistan hem selahedîn
yezdî turkoman aşor û kildan
her kes bi zimanê xwe xwendekarî

* * *

îzgeh tilvizyon karê ser xwebon
tejî û hebon li xwe xweiyê bon
gelek bi mestî azad serbestî
rast û diristî l ber pirsyarî

* * *

ev çar hezar sal miletek xumal
j av û çiya û pal bav û mam û kal
hemî tev kurdin welat bernadin
ser war û qadin her wan di xwarî

* * *

di çom otêlê otêla zeyton
li aliyê rê hinber şîreton
tev cihê gulla li her çar mila
ne çihû û fila nakin vî karî

* * *

ji dervê bajêr deştekî pehin
wekî deryakî ne ser û ne bin
ji hev veristî wek kefa destî
ji têr û mestî j gund û bajarî

* * *

geriyam li deşta deşta hewlêrê
ji alton kopirî liwê ber jêrê
deşta kerkokê ya şimamokê
ne b şev û rokê nabîn bi carê

* * *

ev deştê mene ji welatê mene
cihê hîvi û aborê mene
ji genim û cene hem dar lê hene
şahî û kene ji xwer û vexwarê

* * *

cihê fîqî û hem nîsk û noka
gundor û zebeş gulê berojka
j xiyar û bacan j qîz û lawên can
bi gişt û seyran ser singa yarê

* * *

ji hewlêrê berî min da sipîlik
li dol û çiya j hindik û gelek
di nêrim dara j xox û hinara
gelî û zinara li ser rêbarê

* * *

spîlik bilinde raserê gelî
mêvan dariya hisênê elî
li nav pêşmerga mêrxas li cenga
sigerên singa bi nobedarî

* * *

çend şev di razam xweş û bi goman
em di gerandin bajar û gundan
li dora gelî geliyê elî
çiyayên belî l hemî şon werî

* * *

di çom sipîlik li jora gelî
di bom mêvanê xalid boselî
gelek mêrxase bi deng û base
temen di borê bi cenge darî

* * *

hatiye nasî ceng û mêrxasî
bi deng û basî li kanî masî
her ser leşkere b ceng û singere
li pêş li bere karê çekdarî

* * *

cenge werê baş çê li pêş û paş
rojek nebî şaş singa cêş û caş
her ser bilindî bi xurt û merdî
rêz û ber bendî singa neyarî

* * *

sipîlik ber û jêr di çom xilêfan
ra serê gelî xwarin gihên can
cihê seyranan j xaton û canan
ji xwendevana nayên ji marê

* * *

cihê kurdane mêr û merdane
b box û berana her lê xwedane
çiya hemî qad dil gir û dil şad
pesar û berad yek dikê darî

